Rêka Çêkirna Nanê Darçînê

(1) Bi kefçika darî di legena mezin da têk ve de:
- ½ kûpa ava gerim
- 2 kefçikêt hevîr tirrşî
- 1 kefçika şekirê

(2) Bihêle ḧeta 10 deqîqa. U paşî bike ser:
- 1½ kûpa şîrê gerim
- ½ kupa şekirê
- 2 kefçikêt çayê xwê
- 2 hêka
- ½ kupa nîvişkî
- 7 ḧeta 8 kupêt arî

(3) Têkilî êk u dû bike. U dîv da ji legenê bîne derê u deyne li ser neylunekê. Piçek arî pê wer ke da pê ve ne mînit. Bi her dû desta 5 deqîqa hevîr bike ser neylunê. Tu dişêî piçek arî li gel destêt xu u hevîrê xu bikî.

(4) Li legena xu piçek zeytê bide. Dîv da hevîrê xu bike tê da. Bi destê xu li hevîrê xu piçek zeyt bide.

(5) Bi sifirekekê terr binxêve. Deyne cihekê gerim.

(6) Piştî se'etekê ḧeta dû se'eta hevîrê xu bîne derê u deyne ser cihekê rast ser neylunê.

(7) Bi tîrka hevîrî piçekê peḧin ke. Hevîrê te bila piçekê stîr bit (1 ḧeta 2 santîmetra).

(8) Nîvişkê nerim li hevîrê xu bide.

(9) Li legenekê biçîk hindek darçînê u şekirê pêk ve têkil êk bike. Wê têkilê ya darçînê u şekirê bi kefçikê li hevîrê xu bireşîne.

(10) Hevîrê xu ba de u grrovirr ke ser drêjîê.

(11) Sênîkekê asin yan cam zeyt bike u wî hevîrî bike tê da bi şiklê 'ewilî yan bi şiklê dûê:

(a) Hevîrê badaî deyne li ser sênîkê wek grrovirrekê.

(b) Her 2 yan 3 santîmetira hevîrê xu qet ke wek êk u dû.

(12) Bi sifirekekê terr binxêve. Deyne cihekê gerim.

(13) Wextê hevîr tirrij bî ye (piştî 30 ḧeta 45 deqîqa) hevîrê xu bike di firnê da bu 25 deqîqa.

Germatîa firnê li Emrîke 375° (F) ye
u li Kurdistanê u li Ewrope 190° (S) ye.

(14) Bixu gerim. Xuş e! U 'afîed bit!

"Jîn" rujnameke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara rujina bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.